Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 409 nameronahi@gmail.com 9 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Li Reqayê xizmetên tendurustiyê dewam dikin







Komîteya Tenduristiyê ya bajarê Reqayê kar û xebatên xwe bê navber berdewam dike, hewl xebatên xizmetê yê tenduristiyê baş bike.

Komîteya Tenduristiyê dema ku bajarê Reqayê ji çeteyên DAIŞ`ê hate rizgarkirin, hate avakirin. Ji ber wêrankariya çeteyên DAIŞ`ê binesaziya xizmetên tendurustiyê jî têk çû.

Komîteya Tenduristiyê yek ji komîteyên girêdayî Meclisa Sivîl a Reqayê ye. Armanca wê ew e ku xizmeta tenduristiyê baş bike û pêwîstiyan welatiyan bi cih bîne.

Piştî ku bajarê Reqayê bi temamî hat rizgarkirin komîteyê dest bi xebatên xizmetên tendurustiyê kir. Komîteyê her wiha gelek navendên tenduristiyê li bajarê Reqa û gundewarên wê vekirin. Her wiha dest bi sererastkirina nexweşxaneye El-Wetenî ya dikeve navenda bajêr kir. Komîteyê kar û xebatên dermanxaneyên bajar kir û rukset da wan. Ji ber ku navendên tenduristiyê li bajar tune ne, dest bi avakirina navendan kir. Heta niha 16 navendên tenduristiyê li navenda bajar û gundewarên wê hatine vekirin û gelek yekîneyên gerok di nava gundan de destwerdanên lezgîn dikin.

Heyva Sor a Kurd navenda xwe li ser rêya El-Cezra vekir. Li navendê nexweşiyên hundirîn, jin û zarok têne dermankirin. Navendeke tenduristiyê jî di nava gundewarên rojava de digere û yeke din jî li bajarokê El-Karamê digere û pêwîstiyên tenduristiyê yên xeta rojhilat bi cih tîne.

Komîteyê 5 hemleyên aşlekirinê dest pê kirin. Ji gundewarên wê dest pê kir heta ku gihaşt bajar. Di bajar de jî du hemle hatin destpêkirin. Ew cara yekê ye ku piştî 3 salan hemleya aşlekirinê li bajar hate destpêkirin.

Komîteya Tenduristiyê li bajarê Reqayê ruxset da 6 nexweşxaneyên taybet ku 2 ji wan li gundewarên Reqayê ne. Her wiha nexweşxaneya zayîna jinan hate vekirin. Di wê nexweşxaneyê de beşa taybet a zarokan heye. Hemû pêwîstî û xizmetên tenduristiyê dide zarokan.

Piştî ku gelek nexweşxane li bajar hatin vekirin, ji ber vê yekê pêwîstiya wan bi banka xwînê heye. Komîteya Tenduristiyê banka xwînê li navenda Seyf El-Dewle vekir. Di hundirê bankê de navenda aşlekirinê û navenda nexweşiya tilasmiya jî heye. Li wê derê 177 zarokên ku xwîna xwe diguherin hene û bê pere têne dermankirin.



Gelek projeyên komîteyê ji bo pêşerojê hene. Ji wan yek ji nûve sererastkirina aliyê bakur ji Nexweşxaneya Wetenî ya giştî, navendên kar dest bi sererastkirina nexweşxaneyê kirine. Her wiha wê kadroyên Tenduristiyê ji bo nexweşxaneyê werin diyar kirin û dema ku kar û xebatên sererastkirinê bi dawî bibin wê nexweşxane were vekirin.


Li gorî berpirsan wê kar û xebatên sererastkirinê di nava 3 mehan de bi dawî bibe. Ev ji bo welatiyan pêngaveke girîng e ji ber ku hemû nexweşxane ji ber şer xira bûne.

Komîte kar û xebatên tenduristiyê li hemû bajar û gundewarên wê berdewam dike.

Serokê Komîteya Tenduristiyê Ehmed Îsmîl diyar kir ku ew gelek zehmetiyan di aliyê tenduristiyê de dibînin. Îsmaîl destnîşan kir ku pirsgirêka wan ya sereke ku nexweşxaneyên giştî tune ne û tekez kir ku heger Nexweşxaneya Wetenî ya giştî neyê vekirin wê gelek kêmasî di aliyê tenduristiyê de çêbin.

Di dawiyê de Îsmaîl da zanîn ku divê hemû pêwîstiyên tenduristiyê yên welatiyan bi cih werin anîn û got, "Ji ber ku bajar piştî hatiye rizgarkirin û şêniyên bajar roj bi roj li bajarê xwe vedigerin...*ANHA*

# Pêşbirka hespên Ereb hat lidarxistin








Li Reqayê pêşbirka hespan hate lidarxistin. 13 hespên Erebî tev li pêşbirkê bûn û pêşbirk ji hêla şêniyan ve bi kelecan hate şopandin.

Ciwanên Reqayê li bajarê xwe her sal pêşbirkên hespan li dar dixin. Îsal jî pêşbirk hate lidarxistin û 13 hespên Erebî tev lê bûn. Pêşbirk li ser rêya ax ya gundê El-Fitêh li rojavayê herêma Reqayê pêk hat. Pêşbirk bû du beş; beşa yekemîn ji mehînên kêmî 3 saliyê û beşa duyemîn ji hespên temenên wan 5 salan mezintir pêk tê. Pêşbirkê derdora 2 km dirêj kir paşê li ser asta mehînên biçûk di asta yekemîn de mehîna Xetab El-Iz cih girt, li ser asta duyemîn jî mihîna Berzin cih girt. Di asta duyemîn a hespên temenmezin de, li ser asta yekemîn hespê Diwêş derket û li ser asta duyemîn jî hespê Reyan El-Ebar derket...*ANHA*

# Ji bo Pira Mirad a dîrokî eleqeyeke mezin



Pira Mirad a dîrokî bi hatina demsala havînê re bi eleqeyeke mezin dibîne. Mîna her sal îsal jî pira Mirad bi eleqeya turîst û gelê herêmê re rû bi rû dimîne. Pira ku xwedî 12 çavan e herî zêde bala turîstan dikişîne.

SEMBOLA MÛŞ'Ê; PIRA MIRAD

Erdnîgariya Kurdîstanê bi cihên xwe yên dîrokî pir dewlemend e. Her sal turîstên ku ji derveyî welat tên piştî lêkolînên mezin ji dîroka Kurdîstanê pir bi bandor dibin. Pira Mirad a ku di sala 1871'de hatiye avakirin bi zindîbûna xwe eleqeyeke mezin dibîne. 12 km'yan ji navendê dûr e. Her wiha pir bi taybetmendiya xwe a xwedî 12 çavan kesên ku tên ziyaret dikin bi xweşikbûna pirê bi bandor dibin. Di bin pirê de newala ku diherike xweşikbûneke cûda dide pirê. Mîna her sal îsal jî ji jinan bigire heta ciwanan herkes eleqeyeke mezin dide pir ê. Gelê heremê diyarkirin ku bi hatina turîstan tûrîzma bajêr pêş ve diçe û ew ji vê yekê pir kêfxweş dibin û gotin ku divê her berhemeke dîrokî bê parastin...*JINNEWS*

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 409 9 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Bi lihevhatina Deraa Astana têk diçe



Ezîz KOYLUOGLU *R-4*

# KURDISTAN YEK E PKK KURDISTAN E

Nerazîbûn û hêrsa gelê Kurd li çar parçeyên Kudistanê li dijî êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk her diçe mezintir dibe. Gelê Kurd herî zêde jî li dijî hêzên weke PDK'ê ku piştgiriyê didin dagirkeriya Tirk bi hêrs e.



## DEWLETA TIRK DAGIRKER E

Endamê Desteya Rêber ya KNK`ê Dr. Kamuran Berwarî diyar kir daxuyaniya Nêçîrvan Barzanî ne xizmeta PDK'ê dike, ne jî ya doza gelê Kurd dike û wiha got, "PKK hêzeke Kurdistanê ye û ji bo rizgarkirina hemû gelê Kurd têkoşînê dike. Kurdistan yek parçe ye. Dewleta Tirk li başûr dagirker e."

## PKK'Ê BAŞÛR PARAST

Hevserokê Desteya Karên Derve ya Kantona Cizîrê û endamê Konseya Revêber a KNK'ê Dr. Ebdulkerîm Umer nerazîbûn nîşanî daxuyaniya Nêçîrvan Berzanî da û diyar kir ku ev daxuyanî li dijî yekîtiya netewî ye. Umer got, "PKK'ê başûr parast, yê li başûr dagirker dewleta Tirk e. dewleta Tirk hemû Kurd xistiye hedefa êrîşên xwe." *R-4*





## Li Efrînê hovîtiya leşker û çeteyan didome

Zilm û hovîtiya leşker û çeteyên dagirker yên Tirk li Efrînê her diçe zêde dibe. Dagirker welatiya direvînin û êşkencê li wan dikin û ji bo berdanê jî bi hezaran dolar ji wan dixwazin. Dagirkeran bi ser gundê Gobeka ya Efrînê de girtin û 4 welatiyên din jî revandin. *R-2*

## Ji ber nexweşiyê zarok dimirin



Li nava welatiyên Efrînê yên li Şehbayê dimînin xetereya belavabûna nexweşiyan zêde dibe. Derfetên saziyên li wir jî têra xizmeta tendurustiyê nakin. Li kampa Berxwedan du zarokên ji ber nexweşiyan jiyana xwe ji dest dan. Endamê Heyva Sor a Kurd Emced Qinbir ji saziyên mirovî xwest ku di vê mijarê de bi erka xwe rabin. *R-2*



## Şandeya Qendîlê çû serdana Parlamentoyê

Şandeya berdevkiya gelê Qendîlê dike, ji ber êrîşên dewleta Tirk û hewldanên wê yên dagirkeriyê, duh li Hewlêrê çû serdana Parlamenta Kurdistanê. Şandeyê bi serokê parlementê re hevdîtinê pêk anî. Hat ragihandin ku şandeyê nerazîbûna gelê Qendîlê ya li hemberî êrîş û hewldanên dagirkeriya Tirk ragihandiye. *R-2*

## Endama ciwanên MSD'ê û xwişka wê hatin şehîd xistin



Kesên nasnameyên wan ne diyar, duh serê sibê saet 06.00'an de, bombeyek destan avêtin mala Endama MSD'ê Dîlan Şêx Mehmud a li Taxa Ezîziyê ya Hesekê. Di êrîşa bombeyî de endama MSD'ê Dîlan Şêx Mehmûd û xwişka wê Dîlyar Şêx Mehmûd şehîd bûn. *R-3*

## Ji bo tevlîbûna Festîvala Mazlûm Dogan bang

KCDK-E ji bo 21. Festîvala Çand û Sporê ya Ciwanan a Mazlûm Dogan ku 14'ê Tîrmehê wê bê lidarxistin banga tevlîbûnê kir. KCDK-E' yê wiha got, "Wezîfeyeke me ya bingehîn e ku di vê pêvajoya dîrokî de beşdarî festîvalê bibin û têkoşîna hevpar xurt bikin." *R-5*




## Miradê Nêçîrvan pêk tê, wê here cem dîktator



Piştî ku bi pêşengiya dewleta Tirk referandûma serxwebûna başûr têk çû, ji wê rojê û şûnde Berzaniyan ji bo ku careke din navbera xwe bi dîktator Erdogan re xweş bikin ketin nava lêgerînan. Ji bo vê dijmintiya li Kurdan jî dan ber çavên xwe. Di dawiya dawiyê de Nêçîrvan wê îro biçe Enqerê tevlî merasîma sondxwarina Erdogan bibe. *R-5*

## Gerîla lê da: 4 leşker hatin kuştin




Li başûr û bakurê Kurdistanê çalakiyên hêzên gêrîla yên li dijî artêşa Tirk a dagirker berdewam dikin. Gêrîla derbên giran li artêşa Tirk didin. HPG'ê diyar kir ku li bajarê Gîresûn a Tirkiyê û li herêma Biradost ya başûr di encama çalakiyên gêrîla de 4 leşkerên Tirk hatine kuştin. *R-2*

## Tevahiya Tirkiyê tê tecrîdkirin




Parlementerê HDP'ê yê Rihayê Omer Ocalan diyar kir ku tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tecrîda li ser hemû civakê ye û got: "A rastî îro civak hemû tê tecrîdkirin. Eger em doza azadî û demokratîkbûyîna vî welatî dikin, divê em li dijî tecrîdê derkevin." *R-5*

## Agahî ji Gulîzar Taşdemîr tune ye




Çalakvana Kurd Gulîzar Taşdemîr roja 4'ê Tîrmehê ji aliyê Norwêcê ve radestî Tirkiyê hatibû kirin û ji hingî ve agahî jê nayê girtin. Tevî israra malbatê û parêzeran, rayedarên emniyetê agahiyê nadin. Malbata Taşdemîr ji jiyana keça xwe ya nexweş bi fikar e. *R-3*

## Divê gelên Sûriyê destûra xwe amade bikin



Nîqaşên li ser destûrabingehîn ya Sûriyê berdewam dikin. Endamê Akademiya Aştiyê ya Cîhanê Lewend Mîrko diyar kir, destûra ku di bin siya dagirkeriyê de were amadekirin wê nebe destûreke demokratîk û got, "Divê gelên Sûriyê destûra xwe bi xwe amade bikin." *R-4*

## Nîqaşên rakirina Rewşa Awarte xeyalîne




Hevserokên Giştî yên Partiya Demokratîk a Gelan HDP'ê Pervîn Buldan û Sezaî Temellî, derbarê biryarnameya dawî ya di çarçoveyê Rewşa Awarte hat derxistin de, daxuyaniyek nivîskî weşandin û bertek nîşan dan. Hevserokan diyar kirin ku nîqaşên rakirina rewşa awarte xeyalîne û bal kişandin li ser girîngiya têkoşîna demokrasiyê. *R-2*

## Pirsgirêk bi diyalogê dikare bê çareserkirin



Berdevkê YNK'ê Sedî Ehmed Pîre li ser dagirkeriya Tirk a li ser xaka Başûrê Kurdistanê daxuyaniyeke çapemeniyê da û diyar kir ku divê pirsgirêk bi rêya guftugoyê were çareserkirin. Pîrê got, "Nêrîna me ya derbarê pirsgirêkên li Tirkiyê de neguheriye, pirsgirêk bi şer çareser nabe." *R-5*

# Li Efrînê hovîtiya leşker û çeteyan didome

***Zilm û hovîtiya leşker û çeteyên dagirker yên Tirk li Efrînê her diçe zêde dibe. Dagirker welatiya direvînin û êşkencê li wan dikin û ji bo berdanê jî bi hezaran dolar ji wan dixwazin. Dagirkeran bi ser gundê Gobeka ya Efrînê de girtin û 4 welatiyên din jî revandin.***

Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê, piştî bi ser gundê Gobekê yê navçeya Mabata ya Efrînê de girtin, dest danîn ser hemû navgînên ragihandinê yên gel û 4 welatî revandin.
Li gorî agahiyên ku gundiyên Gobekê dan ANHA'yê, çeteyên Lîwa El-Şemal, El-Cebhe El-Şamiye û Ehrar El-Şerqiya roja7'ê Tîrmehê 4 welatiyên ji gund revandine. Li gorî agahiyan navê kesên revandî wiha ye: Emîr Mistefa bin Mihemed bin Nûr (20), Gilgil Hemû bin Menan (55), Mihemed Hesen bin Abidîn (30) û Xebat Şahîn bin Mustefa (31).
Çavkaniyan diyar kir ku welatiyên hatine revandin ber bi cihekî nediyar ve hatine birin.
Her wiha hate ragihandin ku piştî leşker û çeteyên dewleta Tirk ketine gund, êşkence li hemû ciwanên gund kirine, mal û milkên welatiyan talan kirine û gef xwarine ku tu kes di derbarê bûyerê de agahî nede, parve neke.



## Ji ber nexweşiyê zarok dimirin



Li Kampa Berxwedan 2 zarokan ji ber nexweşiyên cuda jiyana xwe ji dest da. Heyva Sor a Kurd mudaxale li zarokan kir lê belê ji ber kêmderfetan nekarî her du zarokan xelas bike.
Li Kampa Berxwedan a li herêma Şehbayê ku bi piranî welatiyên Efrînê yên ji ber dagirkeriya dewleta tirk mecbûr man koçber bibin tê de dimînin, 2 zarokan ji ber nexweşiyên cuda jiyana xwe ji dest dan. Her du zarok rakirin benda Heyva Sor a Kampa Berxwedan lê ji ber şîr ji sînga Heyder Ebdo (mehek û 5 roj) hat û Beyrem Fêsel Dada (1) jî tê ji bi nexweşiya sehaya ketibû, rayedarên Heyva Sor nikarîbû wan derman bike.
Piştre her du zarok veguhastin Nexweşxaneya Avrîn ya herêma Fafînê ya kantona Şehbayê, lê ji ber giraniya nexweşiyan her du zarokan jiyana xwe ji dest da.
Di vê derbarê de endamê Heyva Sor a Kurd Emced Qinbir wiha got: "Zarokê bi navê Heyder Ebdo rakirin benda Heyva Sor a Kurd lê ji ber derketina şîr ji sîngê wî, me ew rakir Nexweşxaneya Avrîn lê beriya bigihîje nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da û Beyrem Fêsel Dada jî ji ber nexweşiya sehaya ya giran jiyana xwe ji dest da." Qinbir ji rêxistinên mirovî xwest ku alîkariya wan bikin da ku jiyan û tenduristiya welatiyan biparêzin.
Tê zanîn ku bi hezaran welatî ji ber kiryarên dewleta tirk a dagirker bi zorê ji malên xwe derketin.

## Gerîla lê da: 4 leşker hatin kuştin



HPG'ê diyar kir ku li herêma Gîresûnê ya Derya Reş û li herêma Bradostê ya Başûrê Kurdistanê di encama çalakiyên gerîla de 4 leşkerên Tirk hatine kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'e diyar kir, artêşa Tirk a dagirker 1'ê Tîrmehê li herêma Ozluce ya navçeya Guce ya Gîresûnê dest bi operasyonê kiriye û ev agahî da: "Hêzên me roja 6'ê Tîrmehê yekîneyeke operasyonê şopand û saet 18'an ji du baskan ve lê dan. Ji nêz ve li yekîneya dijmin hate xistin û di encamê de 3 leşker hatin kuştin, leşkerek jî birîndar bû. Gelek leşker jî ji kozikên xwe reviyan. Artêşa Tirk a dagirker piştî çalakiyê leşkerên xwe yên mirî û birîndar bi wesayitên zirxî ji herêmê rakir."
Di dewama daxuyaniyê de hate ragihandin ku di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de roja 7'ê Tîrmehê saet 09:30'î li dijî artêşa TC a dagirker a li ser girê Lêlîkanê yê li herêma Bradostê ya Sîdekan a Başûrê Kurdistanê çalakiyeke sûîqestê hate kirin. Li gorî daxuyaniyê, di çalakiya hêzên gerîla de leşkerekî Tirk hatiye kuştin.

## Du endamên Asayîşê şehîd bûn

Li herêma Firatê kantona Girê Spî du endamên hêzên Asayîşê di encama teqîna mayînekê de şehîd bûn.
Şaneyên çeteyên DAIŞ`ê li ser riya di navbera gundê Zêbiqiyê û Hemam Tirkmen ên Girê Spî mayîn bi cih kiribûn û ew mayîn bi erebeya hêzên Asayîşê de teqiya. Di encamê de du endamên Hêzên Asayîşê şehîd bûn.
Ji Rêveberiya Hêzên Asayîşê ya Girê Spî Feysel agahî da û da zanîn ku şeva 8'ê Tîrmehê saet 12:00 mayîn bi dewriyeke wan de teqiyaye û di encamê de du endamên wan şehîd bûne. Feysel di berdewamiya gotinên xwe de anî ziman ku di wextê endamên wan li ser erka xwe bûn şehîd bûn û soz da ku şopa wan bişopînin.




## Nîqaşên rakirina Rewşa Awarte xeyalîne




Hevserokên Giştî yên HDP'ê Buldan û Temellî, bertek nîşanî biryarnameya (KHK) dawî hat derxistin dan û gotin: "Nîqaşên rakirina OHAL'ê xeyalîne."
Hevserokên Giştî yên Partiya Demokratîk a Gelan HDP'ê Pervîn Buldan û Sezaî Temellî, derbarê KHK'a Hejmara 701'an a di çarçoveyê Rewşa Awarte hat derxistin de, daxuyaniyek nivîskî weşandin û bertek nîşan dan.
Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "18 hezar û 632 perrsonel ji kar hatin avêtin. Rojnameyên Ozgurlukçu Demokrasî, Welat, Halkin Nabzi û 12 komele hatin girtin. Dîsa li Mêrsîn, Wan, Bedlîs, Mêrdîn û Rihayê endamên Egîtim Sen û SES'ê ji kar hatin avêtin. Bi KHK'a dawî akademîsyenên aştiyê jî ji kar hatin avêtin. Hejmara akademîsyenên ji kar avêtin derket 404'an. Lê li holê ne dadgehek û ne jî belgeyek heye ku van kesan ji kar bavêjin. Qaşo di bin navê serdema nû de, bi îxraç û binçavkirinan yekem pêngav avêtin. Nîqaşên rakirina OHAL'ê xeyalîne."
HDP'ê di dawiya daxuyaniyê de banga têkoşîna demokrasiyê kir û wiha got: "Hesabên Serokê Giştî yê AKP û Serokkomar, bi kesên koletiya wan na kirin re, bi dawî nabe. Îro têkoşîna demokrasî, hiqûq û edalet ji hemû deman girîngtire û pêdivî heye ku bê mezinkirin. Divê kesên li dijî operasyonên koalîsyona desthilatdariyê bên gel hev û bi hevre têkoşîna demokrasiyê bi rêve bibin."

## Şandeya Qendîlê çû serdana Parlamentoyê



Şandeyeke berdevkê gelê Qendîlê, ji bo êrîşên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Qendîlê gotûbêj bike, çû serdana Parlamenta Başûrê Kurdistanê.
Şandeya berdevkiya gelê Qendîlê dike, ji ber êrîşên dewleta Tirk û hewldanên wê yên dagirkeriyê, duh li Hewlêrê çû serdana Parlamenta Kurdistanê. Şandeyê bi serokê parlementê re hevdîtinê pêk anî.
Hat ragihandin ku şandeya çûyî serdana parlamentê, nearzîbûna gelê Qendîlê ya li hemberî êrîş û hewldanên dagirkeriya Tirk ragihandiye.
Hate ragihandin ku şandeyê ji parlamentê daxwaz kiriye ku li ser van êrîş û hewldanên dagirkeriyê rûniştineke taybet pêk bê.

## Şervanekî QSD'ê li Dêra Zorê şehîd bû

Ji ber êrîşeke çeteyên DAÎŞ'ê ya bi wesayita bombebakirî, şervanê QSD'ê Mihemed Salih li Dêra Zorê şehîd bû.
Navenda Ragihandinê ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) li ser mijarê daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Di daxuyaniyê de hate gotin, "Dema ku şervanên Hêzên Sûriya Demokratîk li herêma Bisêra ya Dêra Zorê bi erka xwe ya leşkerî radibûn, çeteyên DAÎŞ'ê bi wesayiteke bombebarkirî êrîş birin ser bendeke kontrolê. Ji ber êrîşê şervanê me Mihemed Salih şehîd bû."
Di daxuyaniyê de sersaxî ji malbata şehîd Salih re hate xwestin û hate gotin ku wê heta serketinê li ser şopa şehîdan bin.





# Jin parêzvana çanda resene

***Jinên ku beşarî pêşengeha ku Kevana Zêrîn li Dêrikê vekir bûn diyar kirin ku jin çandê diparêzin û pêş dixin. Jinan got, "Di civakê de ya herî zêde li çanda xwe xwedî derkeve jin in."***

**Ferîşte NEZÎR**



Tevgera Kevana Zêrîn a Bakurê Sûriyê di bin dirûşmeya "Bi çanda resen û hunera jinê em ê jiyaneke azad û civakeke wekhev bi afirînin" ser du rojan 2 û 3 Tirmehê li bajarê Dêrikê yekemîn pêşengeke çand û hunera destan a jinan, pirtûk, wênesaz û xwarinên kevnar hate vekirin. Pêşengeh bi armanca parastina û zindî kirina çanda gelerî hate li darxistin, her wiha di pêşengehê de cil û bergên kurdî, karên destan, xwarinên gelerî, govend û staranên herêmî hatin pêşkêşkirin. Têkîladê mijarê rojanameya Ronahî nerînên beşdarvanan girt û diyar kirin ku Jin afrîner û parêzvanê çanda resene."

### PÊŞENGEHA ÇAND Û HUNERA GELAN

Rêvebira Desteya çand û hunera Dêrik Dicle Mihemed derbarê amedekariyên pêşengeha çandê wiha got: "Wekî Desteya Çandê û bi alîkariya kevana Zêrîn ev du mehin amedekariyê vê pêşengeha çandê ku di 2'ê Tîrmehê li bajarê Dêrikê hate li darxistin. Her wiha ne tenê çanda kurdî, çanda pêkhateyên Ereb jî di pêşengehê de hatin pêşkêşkirin, Di pêşengehê de hemû cûreyên çanda kurdî û erbî ser du rojan hatin pêşkêşkirin."
Dicl bal kişand ser cûryên xwarinên filkilorî û wiha pêd çû: "Di pêşengehê de cil û berg, xwarinên filkilorî û karên destan.. hwd. Xwerin wekî kutilk, şamborek, serûpêh, mehir, nanê sêlê, danê hişk û nîsk, armanc ku em çanda xwe biparêzin û ji bo nifşên nû her di civakê de zindî bihlin."

### ÇANDA GELAN Dİ ÇİVAKÊ ZİNDÎ BİKİN

Endam Komîta amedekar Fatma Hisên ser armanc û tevlî bûna xwe wiha got:"Armanc ku civak û gel çanda xwe ya bav û kalan xwedî derkevin û nûjen bikin, her wiha ev pêşengeh bi keda dayiyên temen temen mezin yên ku xwedî çanda kevnar orgenîz kirin."
Fatma yek ji jinên ku xwarinên filkliro amedekir û wiha bi dawî kir: "Hemû cûreyên xwerinên kevnar me çêkirin, di heman demê de jî nanê wekî nanê sêlê, nanê heftik, şilek û tenurê. Her wiha cil û berên kurdî yên hemû herêman yên jinan tenê li pêşengehê pêşkêşkirin, armanc ji vê pêşengehê netenê ku çand kurdî bikin, her wiha ji bo piştgiriya hemleya Serîhilde û rizgarkirina Efrînê ye."

### JİN XWEDÎ ÇANDA RESENE

Fatma Hisên bang li hemû jinan kir ku beşdarî mîna vê pêşengehê bibin û wiha bi dawî kir: "Jin afrîner û parêzvanên çanda resen, ji bo wê jî tenê dikare xwedî li çand û hunera xwe derkeve."

## Zarokên Mexmûrê xwedî li çanda xwe derdikevin



Zarokên Mexmûrê di bin banê Weqfa Jinên Mexmûrê de xwedî li stran û çanda xwe derdikevin.
Zarokên Mexmurê di bin banê Weqfa Jinên Mexmûrê de perwerdeya çand, folklor û Mûzîka Kurdî dibînin. Zarokên perwerdê dibînin weke 3 komên dengbêjî û yek koma govendê ji hev cuda dixebitin. Heftiyê 2 rojan li navenda Weqfê perwerde dibînin.
Mamosteya govendê û stranan Axîn Kara di derbarê xebatên zarokan ên dib banê weqfê de tên perwerde kirin de ev agahî dan: "Her diçe tevlîbûna zarokan zêdetir dibe û niha nêzî 170 zarokên Mexmûrî di biniya Weqfê de perwerdê dibînin. Zarok tenê nayên perwerde kirin, di heman deme de bi kombûna wan û lîstokan civata xwe jî mezin dikin."
Axîn diyar kir ku ew li hemberî pergala zarokan ji çanda wan dûrxistiye şer dikin û zarokan li derdora çanda xwe kom dikin.
Axîn ji bo bernameya havînê jî da zanîn ku amadekariyên wan ji bo Vejîna 15'ê Tebaxê û Festivala Zarokan hene û axaftina xwe wiha bi dawî kir; "Lê niha ji ber germê heya 15'ê Tîrmehê emê navberê bidin xebatên xwe yên prova û perwerdekirina zarokan."...***ROJNEWS***

## Şanoya "Dûvê Hespê" hat pêşkêşkirin



Endamên Desteya Çand û Hunerê ya Kantona Efrînê şanoya bi navê " Dûvê Hespê" ji şêniyên Kampa Berxwedan a Şehabyê re pêşkeş kir.
Bi armanca xêzkirin û kenê li ser rûyê zarokên Kampa Berxwedan, endamên Desteya Çand û Hunerê ya Kantona Efrînê şanoyek xwe ya bi navê "Dûvê Hespê " pêşkeş kirin.
Şano vê êvarê hate pêşkeşkirin. Naveroka şanoyê ew e ku tu bawerî bi dijminan nayê, dijmin di her fersendekî de peymanan binpê dike û xiyanetê dike.
Şano di nav çepkên şêniyan bi dawî bû ...***ANHA***

## 4. Festîvala Ivana Hoffmann pêk hat



Festîvala 4. a ji bo bîranîna şervana MLKP'ê Ivana Hoffmann a li Rojava şehîd bû, bi şiyara "Ji Dûîsbûrgê heta Rojava bijî têkoşîna antî-faşîst" li bajarê Dûîsbûrg ê Elmanyayê pêk hat. Festîvala êvara Înê bi forûmekê dest pê kir. Roja Şemiyê girseya gel saet 13'an ji ber gara trenê ya Dûîsbûrgê dest bi meşê kir û heta qada festîvalê meşiya.
Bi sedan kes tevlî meşê bûn û bi qîrîna dirûşmên "Ji Dûîsbûrgê heta Rojava, navê berxwedanê Ivana Hoffmann e", "Jin, jiyan, azadî" bi qasî 2 kîlometreyan meşiyan.
Festîvalê saet 15'an dest pê kir û komên muzîkê yên ji Afrîka, Elman û Kurd derketin ser dikê. Dayika Ivana Hoffmann Ella Hoffman, nûnerên Partiya Çep a Elman (Dîe Lînke), Yekîtiya Jinên Sosyalîst, KCDK-E û parlamentera berê ya Wanê ya HDP'yî Tûba Hezer li festîvalê axivîn.
Kesên axivîn bal kişandin ser têkoşîna Ivana û hevalên wê.
Piştî axaftinan komên muzîkê bi Kurdî, Erebî û Elmanî hunera xwe pêşkêş kirin.
Ivana Hoffmann, 7'ê Adara 2015'a li bajarê Til Temir ê Rojavayê Kurdistanê di şerê dijî çeteyên DAÎŞ'ê de şehîd bûbû.

## Çend mînak ji bo têkoşîna zimanê Dayikê



**Derwêş M. FERHO**

Li gelek welatan têkoşîna zimanê dayikê hatiye dayin. Bi vê têkoşînê jî nasnameya xwe parastine û neteweya xwe ava kirine. Norwêcî di hember Danmarkî de, Korsîkî, Baskî, Katalanî û Bretonî di hember Frensizî û Spanî de, Çekî di hember Almanî de, Flaman di hember Frensizî de, Walesî (Galles) di hember Ingilîzî de. Mînakên din jî hene. Ev gel û yên din jî di vê têkoşînê de gihane qonaxeke ku êdî ew bi zimanê dayikê di asteke bilind de ne. Ji wan mînaka yek ku ji me re balkêş e.
Têkoşîna ji bo zimanê Flamanî (Hollandî) li Beljîka di hember asîmîlasyona Frensizî de balkêş e. Ev têkoşîn di nava çarçeweya pirsgirêka nasnameya gel de hate meşandin. Ev têkoşîn 180 e sal dom dike. Gelekî grirîngî dane ser xebata ziman. Pêkanîna sînorên ziman li herêmên cuda, di parlemento de reformên dewletê, federalîzekirina Beljîka mînakên hêja ne. Bi gotineke din Flamanan têkoşîna zimanê dayikê ji xwe re kire têkoşîna sereke ji bo azadiya gelê xew. Bê goman, têkoşîna bidestxistina hêza aborî, perwerdeyeke bi kalîte û xwedîlêderketineke nirxên neteweyî bi serbilindî jî di heman demê de paşguh nekirin.
Falamanan cara yekê di 1840 de daxwazên doza perwerdeya zimanê dayikê fermî dan mercên dewletê. Paşê doza zimanê xwe di dadgehan de kirin. Sedem, "em bi zimanekî ku jê fehm nakin tên darizandin. Sedema sûc û cezayê xwe tê naghin."
Di 1848 de guhertina mafên bijartinan baş bi kar anîn. Bi rayên xwe (deng) tesîr li siyaseta dewletê kirin. Tiştê balkêş ev e ku hêza serdest (dewletî) Flaman mecbûr kirin ku nivîsa zimanê wan divê ji heman zimanê Holandî li Hollanda cuda be. Mecburiyeta nivîsa cuda ji bo heman zimanî danîn. Ev yek rewşa zimanê Kurdî tîne ber çavan. Dema li Iraq û Kafkasya Sovyetê, zimanê Kurdî jî kete fermiyetê, dewleta Turk hezar dep û dolab kirin û bi wan dewletan re têkilî danîn ku ne yek alfabeya Kurdî were pêkanîn. Li Iraq alfabeya Aramî/Erebî û li Sovyetê jî Kirîlî hate bikaranîn. Bi wî awayî sê alfabeyên me çêbûn û ziman kete bin xetera cudabûnên ciddî.
Flamanan têkoşîna xwe domand. Di 1898 de cara yekê ye ku zagona ziman dan pejirandin. Û bi vê yekê zimanê Flamanî (Hollandî) di fermiyetê de bû xwedî cihekî mîna Frensizî. Xwendegehên serete, navîn, bilind û dezgehên fermî xebateke bê rawestan kirin ku zimanê xwe di her warî de û li her cî bi kar bînin. Di dagehan de, leşkerî, şahredarî, perwerde, …
Di vê navberê de du şerrên cîhanê pêk hatin. Paş şerrê duyemîn, Flaman bi sûcê hevalbendên Naziyan hatin bi nav kirin. Sedem, li hember serdestiya Frensizan serî hildidan û Frensiz jî tev gelek dewletên din di wê demê de dijî Nazîzme bûn. Lê van rexnegîran tu car hêza dijber ku li Flander û Hollanda di hember Nazîzmê de têkoşîneke bêhempa meşandinj nedît.
Li vira dîsa Kurdistan tê ber çavê min. Kurd li herêma Rojhilata Navîn, di pêkanîn û avakirina gelek tiştên giranbiha de xwediyê ciyekî gelekî bi rûmet in. Lê 95 % rexnegîrên ji gelên serdest Kurdan re reşbînin. Kurd nezan in, zimanê Kurdan ne zimanê bikaranînê ye, Kurdî di perwerdê de têr nake, dîrok û kultûra Kurdan ciyê nîqaşê ye, Kurd zû tên bikaranîn û gelek mînakên din. Lê balkêş e ku ew li neynikê li xwe nanêrin û rastiya xwe naxwazin bibînin.

# Li Reqayê şopên wehşeta DAIŞ'ê, gorên komî

Piştî ku DAIŞ'ê bajarê Reqayê dagir kir zilm û wehşeta ku nehatiye dîtin li dijî gelê bajêr pêk anî. Şervanên QSD'ê jî piştî ku Reqa rizgar kir şopên wehşeta çeteyan yek bi yek derdikevin holê. DAIŞ'ê bi sedan welatiyên bê guneh qetil kir. Heta niha Hezar 238 cenazeyên ku nasnameyên wan nehatine hînbûn ji gorên komî hatine derxistin.



Bi hezaran welatiyên sivîl ên herêma Reqayê bi destên çeteyên DAIŞ'ê hatine kuştin û di gorên komî de hatin binaxkirin. Ji dema ku Reqa hatiye rizgarkirin ve, Yekîneya Bersivdariya Yekemîn heta niha hezar û 238 cenaze ku nasnameyên wan nehatine naskirin dîtin û li goristanê spartin axê.
Bi destpêkirina pêngava Xezeba Firatê re, Yekîneya Bersivdariya Yekemîn hat avakirin. Yekîneyê ji destpêka hatiye avakirin ve bi awayekî rêk û pêk xebatên xwe dimeşîne.
Yekîne ji 4 endaman pêk dihat û bi dilxwazî xebatên xwe li gundewarên Reqayê birêve dibir. Bi pêşveçûn û berfirehbûna serweriya şervanên Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) re yekîneyê jî kar û xebatên xwe berfirehtir kirin. Piştî ku bajarê Reqayê hate rizgarkirin hejmara endamên yekîneyê jî zêde bû û gihişt 40 endaman. Di nava endamên yekîneyê de 4 bijîşk hene.
Peywira sereke ya vê yekîneyê ew e ku cenazeyên welatiyên sivîl ku çeteyên DAIŞ'ê bê ser û ber li herêmê binax kirine, derxe û bi awayekî guncaw li goristanan bispêre axê.
Yekîneyê di bajarê Reqayê de 4 gorên komî dîtin, gora Parka Lawiran, gora El-Reşîd a li paş dadgeha kevn a bajêr û heta niha 600 cenaze li van goran hatine vedîtin û belgekirin. Li gora Panorama û gora Bexdayê jî 500 cenaze hatine dîtin û belgekirin.

### HÊJMARA CENAZEYAN NAYÊ ZANÎN

Çeteyên DAIŞ'ê li gelek navçe û deverên bajêr li nêzî gulistan, parka lawiran û lîstokgehan, çalên bi awayekî paralel kolandibûn û cenazeyên sivîl bê ser û ber avêtibûn goran.
Di gorên komî de cenazeyên zarok, jin û ciwanên ku çeteyan ji xwe re kiribûn mertalên zindî, hene. Ji destpêka rizgarkirina Reqayê ji hêla QSD'ê ve, Yekîneya Bersivdariya Yekemîn hezar û 238 cenaze derxistine.Li gorî belgeyên yekîneyê, welatiyên bajêr 117 daxwaznameyên cenazeyan pêşkêş kirinê, lê yekîneyê tenê 17 cenaze derxistine.Ji bo cenazeyên welatiyan bi awayekî guncaw bêne derxistin, yekîne xebatên derxistinê bi alav û amûrên hêsan dimeşîne. Welatî bi rêya dayîna agahiyên derbarê cihê gorên xizmên xwe de yan jî bi rêya cil û amûrên kesayetî cenazeyan nas dikin û bi vî awayî alîkariya yekîneyê dikin.
Cenazeyên ku nasnameyên wan nehatine naskirin, yekîne agahiyên girêdayî her cenazeyekê li ba xwe belge dike û li goristanên şehîdan ên bajêr dispêrin axê.
Tevî hemû xebatên ku yekîneyê di vî alî de pêk anîne, lê dîsa jî ji ber tunebûna alav û amûrên pêşketî gelek caran rastî astengiyan tê.
Derbarê vê mijarê de serokê yekîneyê ya herêma başûrê Reqayê Ebdulreûf axivî û diyar kir ku yekîne ji ber tunebûna alavên nû nikare bi awayekî sîstematîk cenazeyan derxîne û nasnameyên wan bidin nasandin…*ANHA*

## Şertên jiyana Êzidiyên li kampan zehmet e



Êzidiyên ji ber êrîşên çeteyên DAIŞ'ê ji Şengalê koçberî herêmên cûda yên Başûrê Kurdistanê bûne û di nava kampan de dijîn, rastî gelek zehmetiyan tên û ji aliyê rêveberên kampan ve tên paşguh kirin.
Piştî êrîşa çeteyên DAIŞ'ê ya 3'ê Tebaxa 2014'an bi hezaran Êzidiyên Şengalê ji neçarî koçberê herêmên cûda yên Başûrê Kurdistanê bûn û li kampan bicih bûn. Yek ji kampên Êzidî lê dimînin Kampa Bacîd Kengal a girêdayî navçeya Zaxo ya parêzgeha Dihokê ye. Mirad Xêro yek ji welatiyên di kampê de dijî û berî 10 rojan ji ber şewatê çadir û hemû eşyayên mala wî şewitîn. Lê heya niha rêveberê kampê yê bi navê Sebah Berwarî ve ti alikariyek ji bo Mirad Xêro nehatiye kirin.
Kesekî ku li wargehê dimîne û nexwest navê xwe eşkere bike, diyar kir ku heya niha gelek bûyerên şewat û yên rabûna lehiyê li wargehê çêbûne û wiha axivî; "Ev nêzî 3 meh e em li nava kampê ji ber nebûna ceyranê û kêmbûna avê pir zehmetî dikişinin. Kesên çadirên wan dişewitin rêveberiya kampê alikariyê nade wan.
Malbata Mirad Xêro ev deh rojin bê çadirin û li derve dimînin. Ji ber şewatê çadir û hemû eşyayên wan şewitîn. Heya niha ti alikarî ji bo wan nehatiye kirin. Tenê carek jî rêveberê wargehê Sebah Berwarî serdana wan nekiriye."
Bi hatina demsala Havînê re Êzidiyên li Wargehên Başûrê Kurdistanê dimînin, gelek caran rastî bûyerên şewata çadir û rabûna lehiyê hatine. Di nava 2 mehan de ji ber şewatê 2 kesan jiyana xwe ji dest dane…*ROJNEWS*

## Komîteya Civak û Baweriyan cîvînek li dar xist



Bi dirûşma "Aştiya demokratîk bingeha avakirina exlaq e" Komîteya Civak û Baweriyan a herêma Dêrikê civînek lidarxist. Di civînê de nameya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a ji Kongreya Îslama Demokratîk re şandibû jî hate xwendin.Di civînê de gelek zanyarên olî yên herêma Dêrikê amade bûn. Civîn bi dirûşma "Aştiya demokratîk bingeha avakirina exlaq e" li Hola Çand û Hunerê ya Aram Tîgran a bajarokê Rimêlan hate lidarxistin.Endamê komîteya amadekar a civînê Mazin Harûnî xêrhatina mêvanan kir û girîngiya konferansê ji beşdaran re şîrove kir. Her wiha nameya ku Rêberê Gelê Kurd Abdulhah Ocalan di sala 2014'an de ji Kongreya Îslama Demokratîk a li Amedê re şandibû, di civînê de hate xwendin. Di civînê de semîner hatin pêşkêşkirin.
Komîteya amadekar da zanîn ku dê gelek civînên bi vî rengî li hemû heremên Bakurê Sûriyê werin lidarxistin…*ANHA*

## Civîn li ser pêşxistina aboriyê hate lidarxisitn



Komîteya Pêywendiyan a Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a herêma Tebqayê ji bo pêşxistina aboriya herêmê û destekê bide şêniyan ku projeyên xwe pêk bînin civînek lidarxist.
Endamên Komîteya peywendiyan, Hevseroka Komîteya Têkîliyan a Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a herêma Tebqayê Asya El-Xerbî û bi dehan şêniyên herêmê tevlî civînê bûn.
Endamê Rêveber ê Komîteya Peywendiyan a Reqayê Ebdulah El-Eryan armanca li darxistina civînê diyar kir û got, "Me ev civîn li dar xistiye da ku li gorî derferên di dest me de bi we re bibin alîkar, di encamê de emê bi hev re aboriya civaka xwe pêş bixînin."
Hevseroka Komîteya Têkîliyan Asye El-Xerbî çend proje, ji wan sererastkirina riyên di navbera Tebqa, Reqaû El-Cirniyê pêşkeş kir.
Endama Rêveber a Mala Jin a El-Cirniyê Foza El-Hesen ji bo pêşxistina aboriya herêmê bang li pêşxistina projeyên jinê weke werşeyên dirûnê û alîkariya çandiniyê kir.
Di dawiya civînê de, komîteyê soz da ku ew ê alîkariya şêniyan bike…
*ANHA*

## Akademiya Civaka Demokratîk dewreyek nû destpê kir

Akademiya Civaka Demokratîk a Kobanê dewreyeke perwerdê ya bi navê şehîd Sarya Cûdî ji endamên Meclisa Malbatên Şehîdan re destpê kir.Akademiya Civaka Demokratî di encama xebat û kedeke mezin de beriya çend rojan şaxê xwe li bajarê Kobanê bi navê Akademiya Şehîd Hogir vekir, Dewreya yekem di şaxê Akademiyê de bi navê Şehîd Sarya Cûdî hate destpêkirin.
Dewreya destpêkê bi beşdarbûna 30 endamên meclîsa malbatên şehîdan hate destpêkirin. 15 ji endamên dewreyê jin in.
Dewre wê 25 rojan dewam bike, di dewreyê de wê li ser gelek mijaran dersên cuda werin dayîn.
Yek ji Rêveberên perwerdeyê Serdar Benek da zanîn ku armanca dewreyê ew e ku civak di aliyê bîrdozî de were pêşxistin û girîngiya perwedeyê hîn bibe û wiha got: "Çawa pêwîstiya mirov bi xwarinê heye, ewqasî pêwîstiya mirovan bi perwerdeyê jî heye."
Akademiya Civaka Demokratîk a Herêma Firatê di 6 mehên dawiyê de hezar endam perwerde kirin.



# Agahî ji Gulîzar Taşdemîr tune ye

***Çalakvana Kurd Gulîzar Taşdemîr roja 4'ê Tîrmehê ji aliyê Norwêcê ve radestî Tirkiyê hatibû kirin û ji hingî ve agahî jê nayê girtin. Tevî israra malbatê û parêzeran, rayedarên emniyetê agahiyê nadin. Malbata Taşdemîr ji jiyana keça xwe ya nexweş bi fikar e.***



Agahî ji aktîvîsta Kurd Gulîzar Taşdemîr nayê girt ku Norwêcê ew roja 4'ê Tîrmehê bi rengekî nehiqûqî radestî Tirkiyê kiribû. Tevî israra malbatê û parêzeran, rayedarên emniyetê agahiyê nadin. Malbata Taşdemîr bi fikar e.
Aktîvîsta Kurd Gulîzar Taşdemîr roja 4'ê Tîrmehê ji aliyê Norwêcê ve radestî Tirkiyê hatibû kirin û ji hingî ve agahî jê nayê girtin.
Taşdemîr sala 2015'an ji bo mafê penaberiyê serî li rayedarên Norwêcê da, lê belê bi gotina "Tu siyasî nîne, tu vegere Tirkiyê jî xeterî ji bo te nîne" serlêdana wê nehate qebûlkirin. Taşdemîr ji ber vê bersiva Norwêcê, serî li Elmanyayê da lê belê 2'ê Tîrmehê bi lez û bez radestî Norwêcê hate kirin. Norwêcê jî roja 4'ê Tîrmehê bi rengekî kelepçekirî radestî Tirkiyê kir.
Ji 4'ê Tîrmehê û vir ve agahî ji Gulîzar Taşdemîr nayê girtin. Tê texmînkirin ku Taşdemîr li Şaxê Têkoşîna li dijî Terorê ya Stenbolê (TEM) girtî ye. Taşdemîr ku nexweşiyên giran pê re hene, nayê zanîn bê muameleyeke çawa lê tê kirin. Malbat û parêzerên wê ji bo agahiyê jê bigirin hewl didin, lê heta niha agahiyek jê negirtine.
Herî dawî bavê Taşdemîr Mûstafa Taşdemîr tevî parêzeran serî li emniyetê dan, lê belê gef li wan hate xwarin. Li gorî agahiyan, rayedarên midûriyeta emniyetê ya Stenbolê gef li malbatê xwarine û ji wan re gotine, "Hûn nikarin keça xwe li vir bibînin. Kengî kete girtîgehê, hûn ê wê çaxê li girtîgehê wê bibînin." Malbata Taşdemîr ji jiyana keça xwe ya nexweş bi fikar e.

## Endama ciwanên MSD û xwişka wê hatin kuştin



Endama Meclîsa Ciwanên Sûriyê Demokratîk (MSD) û xwişka wê di êrîşek bombeyî de jiyana xwe ji dest dan.
Kesên nasnameyên wan ne diyar, duh serê sibê saet 06.00'an de, bombeyek destan avêtin mala Endama Meclîsa Ciwanên Sûriya Demokratîk (MSD) Dîlan Şêx Mehmud a li Taxa Ezîziyê ya Hesekê. Di êrîşa bombeyî de endama MSD'ê Dîlan Şêx Mehmud û xwişka wê Dîlyar Şêx Mehmud jiyana xwe ji dest dan.
Piştî bûyerê, hêzên Asayîşê çûn cihê bûyerê û dest bi lêpirsînê kirin.

## Amadekariyên Kongreya Star a duyemîn didomin



Ji hêla jinên taxa Şêxmeqsûd a Helebê ve, Emel Horê û Şêrîn Elî wek serokên komînên Xeta Şehîd Şîlan Kobanê hatinhilbijartin.
Di çarçoveya civînên Kongreya Star de yên ji bo hilbijartinên hevserokên komînan û amadekariyên kongreya duyemîn a Kongreya Star de, civînek li Xeta Şehîd Şîlan Kobanê hate lidarxistin û hevserokên komînan hatin hilbijartin.
Di civînê de rêvebera Kongreya Star Fatima Hesen da zanîn ku jinan li Bakurê Sûriyê gelek pêşketin bi xwe re çêkirin û ji ber wê jî jinan nîşanî hemû cîhanê dan ku pêşketina ji hêla rêxistinî ve, gelek pêşketin û serkeftinan bi xwe re tîne.
Di dawiyê de Emel Horê û Şêrîn Elî wek serokên Xeta Şehîd Şîlan hatin hilbijartin.

## YJC'ê li dijî êrîşên dagirkeriyê bang kir



Yekîtiya Jinên Ciwan YJC'ê ya kantona Kobanê diyar kir ku êrîşên dagirkeriya Tirkiyê yên li ser Başûrê Kurdistanê tevahî parçeyên Kurdistanê hedef dike û bang li hemû jinên ciwan û ciwanan kir ku berê xwe bidin çeperên berxwedanê û parastina axa xwe bikin.
Yekîtiya Jinên Ciwan YJC'ê a Kantona Kobanê bi amadebûna bi dehan jinên ciwan ên herêma Firatê derbarê êrîşên dagirkeriya Tirkiyê yên li ser Başûrê Kurdistanê daxuyanî da. daxuyanî ji aliyê endamê YCR'ê Rohat Hecî Mehmûd de hate xwendin.
Di daxuyaniyê de wiha hate gotin; "Bi sedsalane li Kurdistanê, êrîşên qirkirinê yên faşîzmê didomin. Dewleta Tirk piştî Efrînê dixwaze bi başûrê Kurdistanê êrîşûn xwe berdewam bike.Piştî ku dewleta Tirk a dagirker li Efrînê li hember berxwedanê têk çû pêvajoya hilweşandina rêjîma wê jî dest pê kir, lewra jî li dijî gelê kurd her cure planên êrîşan xistiye dewrê.
Dewleta tirk a dagirker û mêtînger bi êrîşên hovane meskenên gerîlayan û cîhên sivîlan ev demeke bombebaran dike. Li hemberî vê jî Kurd li başûrê Kurdsitanê berê xwe didin Qendîlê.
Divê demê de ji bo kurdan parastina ax ji nan û av pêwîstir e. Em weke jinên ciwan bang li hemû jinên ciwan û ciwanan dikin ku berê xwe bidin çeperên berxwedanê û parastina axa xwe bikin û li hemberî dagirkeriyê serî hildin."

## Jinên Efrînê soza bilindkirina têkoşînê dan







Jinên Efrînê li Kantona Şehbayê yên li taxa Ehdas dimînin bi rihê Berxwedana Serdemê tevlî seferberiya ku di Konferansa Rizgarikirina Efrînê de hatiye ragihandin dibin.
Derbarê encamên konferansê û rol û misyona jinan di vê seferberiyê de, jinên Kurd ên li taxa Ehdas dimînin nerînên xwe bi rojnameya me re parve kirin.
Jina bi navê Emîne Nasan ku dayîka Şehîd Xemgîn e ya ji navçeya Cindirêsê bi van axaftinan nerîna xwe anî ziman: Lidarxistina Konferansa Rizgarkirina Efrînê mesejeke jinê ji dagirkeran re bû ku wê Efrîn bi destê jinan bê rizgarkirin. Dayîka Şehîd Xemgîn bang li tevahî jinên Kurd û cîhanê kir ku cihê xwe di refên serfeberiya hatiye ragihandin de bigirin û got: Erka rizgarkirina Efrînê peywira her jineke azad e.Jina êzîdî ya bi navê Kurdistan Hiso ya ji navçeya Cindirêsê got: Jina Kurd îro ji her demê bi hêztir e. Dagirkerî nikare vîna jinan bişikîne. Em ê tola jinên Şengalê û Efrînê bi tevlîbûna nava vê seferberiyê hildin.
Ji aliyê xwe jina bi navê Rehîme Xelîl a ji navçeya Şiyê ev tişt anî ziman: Çawa masî nikare bê av bijî, jinên Efrînê jî nikarin bê Efrînê bijîn. Ji bo rizgarkirina Efrînê êm ê erkên pêşeng di seferberiya hatiye ragihandin de bigirin ser milê xwe. Her wiha em bang li sazî û dezgehên mirovî dikin ku di ê derbarê de erk û peywirên xwe pêk bînin.Hêjayî gotinê ye ku di navbera 18 û 21 Hezîrana derbasbûyî de Konferansa Rizgarkirina Efrînê li Şehbayê hatibû lidarxistin. Di konferansê de rola pêşeng a jinê ji nû ve hatibû tekezkirin…
***Şîlan Efrîn***

## Kongreya Star Meclisên nû ava dike



Rêxistina Kongreya Star ya navçeya Mexmûr û Til Mecdel yên girêdayî Hesekê meclisên xwe avakirin.
Rêxistina Kongra Star bi armanca pêşxistina kar û xebatê li Navçeya Mexmûr û Til Mecdel yên girêdayî Hesekê ya Herêma Cizîrê bi civîna ku li dar xistin meclisên xwe avakirin.
Di civîna ku hat lidarxistin de berdevka Kongreya Satar a navçeya Serêkaniyê Selwa Ehmed, Rêvebera Kongreya Star a Herêma Cizîrê Welîda Botî, Rêvbera Kongreya Star a Kantona Hesekê Helîma Ehmed û gelek jin amade bûn.
Di civînê de hevpeymana civakî ya Kongreya Star ji aliyê Berdevka Kongreya Star Selwa Ehmed a Navçeya Serêkaniyê ve hat xwendin.
Rêvebera Kongreya Star a Herêma Cizîrê Welîda Botî li ser rol û rêxistina jinan axivî û wiha got, "Bi hezaran sal e têkoşîn li hemberî zihniyeta baviksalarî tê meşandin. Divê jin li hemberî koletiyê tû caran serî netewînin, xwe bi rêxistin bikin ji bo ku bikaribin jiyanek azad bijîn. "
Di heman demê de li navçeya Til mecdelê civîn hate li darxistin. Di civînê de rêvbera Kongreya Star ya Hesekê Helîma Ehmed axivî û wiha got: "Divê jin di civakê de rola xwe bilîzin û erka wan e ku hemû jinan bi rêxistin bikin."
Piştî axftinan, Meclisa Kongreya Star li Navçeya Mexmûrê ji 7 jinan û li Til Mecdelê jî 7 jinan meclisên navçeyan ava kir…

# Daxuyaniya Barzanî li dijî yekîtiya netewî ye

***Hevserokê Desteya Karên Derve ya Kantona Cizîrê û endamê Konseya Revêber a KNK'ê Dr. Ebdulkerîm Umer nerazîbûn nîşanî daxuyaniya Nêçîrvan Berzanî da û diyar kir ku ev daxuyanî li dijî yekîtiya netewî ye. Umer got, "PKK'ê başûr parast, yê li başûr dagirker dewleta Tirk e."***



Ebdulkerîm Umer anî ziman ku daxuyaniya Barzanî li dijî yekîtiya neteweyî ye û dagirkeriya Tirkiyê rewa dike. Umer her wiha diyar kir ku li hemberî dagirkeran yekitiya kurdî pêwîst e.

Hevserokê Desteya Karên Derve ya Kantona Cizîrê û endamê Konseya Revêber a KNK'ê Dr. Ebdulkerîm Umer derbarê êrîşên dewleta tirk a dagirker ên li ser başûrê Kurdistanê û daxuyaniya serokwezîrê herêma başûrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî de axivî û diyar kir ku Barzanî bi daxuyaniya xwe êrîşên dagirkeriya Tirkiyê yên li ser başûr meşrû dike.

Ebdulkerîm Umer da zanîn ku ev demeke dirêj e dewleta tirk êrîşî xaka başûrê Kurdistanê dike, hin herêm dagir kirine û got: "Dewleta tirk bi armanca Împaratoriya Osmanî û Misakî Millî zindî bike Efrîn, Cerablus, Bab û gelek heremên cuda dagir kirin, rojane gefên dagirkirina Şengal, Mexmûr, Silemanî, Qendîl, Heleb, Mûsil, Helepçe hwd. dixwe û dixwazin wan bajaran tev li xilafeta osmanî bikin. Dewleta tirk a dagirker eşkere dibejê ku destkeftiyên gelê kurd hedef digirin. Her tim dibejin ku ew hebûna kurdan qabûl nakin. Ne parçeyek Kurdistanê, her çar parçeyên Kurdistanê hedef digirin."

Ebdulkerîm Umer di berdewama axaftina xwe de bal kişand ser hincetên dewleta tirk ên bi armanca dagirkirinê û bi bîr xist ku Tirkiye her tim PKK'ê dike hincet da ku êrîşên xwe yên dagirkirinê li ser herêmên kurdan pêk bîne û wiha dewam kir: "Yên ku gelê başûrê Kurdistanê ji êrîşên çeteyên DAIŞ'ê xelas kirin PKK bû. Berxwedana ku gerîla li vir da meşandin pir pîroz e. PKK'ê ji bo rizgarkirina xelkê Başûr bi dehan şehîd dan. PKK başûrê Kurdistanê dagir nake lê dewleta tirk dagirkeriyê pêk tîne."

Ebdulkerîm Umer li ser daxuyaniya Nêçîrvan Barzanî ku gotubû PKK'ê axa başûr dagirkiriye diyar kir ku daxuyaniya Barzanî li dijî yekîtiya neteweyî ye û nakeve xizmeta gel û got: " Ev daxuyanî êrîşên dewleta tirk li ser axa başûrê Kurdistanê meşrû dike. Barzanî bi vê daxuyaniya xwe diyar dike ku ew destekê dide dewleta Tirkiyê û parastina wê dike, daxuyaniya wî xetereyeke mezin e. Dewleta tirk li dijî destkeftiyên gelê kurd tev digere, ji lew re bila kes nebe alîkarê dagirkeriyê."

Hevserokê Desteya Karên Derve yê Kantona Cizîrê û endamê Konseya Revêber a KNK'ê Dr. Ebdulkerîm Umer di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser yekitiya kurdan û wiha got: "Bi yekitiya gelê kurd li dijî wan êrîşan em dikarin roleke bibandor bilîzin. Her wiha girîngiya kongreya neteweyî dîsa derdikeve holê. Li dijî hemû êrîşên dewleta tirk ên li ser axa Kurdistanê pêwîst e kongreya neteweyî were lidarxistin."… *ANHA*

## Daxuyaniya Nêçîrvan zerarê de PDK'ê jî

Endamê Desteya Rêber ya KNK`ê Dr. Kamuran Berwarî diyar kir ku li Başûr PKK ne dagirkere û got: "Daxuyaniya Nêçîrvan Barzanî ne xizmeta PDK'ê dike, ne jî ya doza gelê Kurd dike."

Bertekên li dijî gotinên Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Cîgirê Serokê PDK'ê Nêçirvan Barzanî ku gotibû`PKK beşek ji xaka Herêma Kurdistanê dagirkiriye' didomin.

Endamê Desteya Rêberiya KNK`ê Dr. Kamuran Berwarî eşkere kir ku ew gotinên Barzanî ne di berjewendiyê gelê Kurd û ne jî di berjewendiyê PDK`ê de ne û got; "PKK hêzeke Kurdistanê ye û ji bo rizgarkirina hemû gelê Kurd têkoşînê dike. Ji bo statûyekî siyasî û demokratîk ya Kurdsitanê kar dike.Dr. Kamûran Berwarî Nêçîrvan Barzanî rexne kir û wiha axivî: "Ew daxuyaniya Nêçîrvan Barzanî ji bo Tirkiyê dibe hincetek ku bikeve xaka Başurê Kuridstanê. Ew gotinên Barzanî ne di berjewendiyê gelê Kurd û ne jî di berjewendiyê PDK`ê dene. PDK yekem zerermend dibe ji hatina Tirkiyê ya xaka Herêma Kurdistanê. PKK li Başûr ne dagirker e. Kurdistan yek parçeye Bakur, Başûr, Rojhilat û Rojavayê wê nîne. Ew sinorên ku ji bo Kurdistanê hatine danîn ji derveyî îradeya gelê Kurd e û em wan sinoran nas nakin. PKK hêzeke Kuridstanê ye û ji bo rizgarkirina hemû gelê Kurd e. Ji bo statûyekî siyasî û demokratîk a Kurdsitanê kar dike."Berwarî rexne li PDK'ê kir û got; "Ketina PDK'ê li eniya Tirkiyê xizmeta doza Kurd nake, nakokiyên nava mala Kurd kurtir û mezintir dike. KNK amadekariyên konferanseke awarte ya neteweyî ya paşeroj û statûya Kurdistanê diyar bike, dike. Divê hemû hêzên siyasî û saziyên sivîl di bin sîwana KNK'ê de kom bibin. Pêwîste Nêçîrvan Barzanî û hikumeta Herêma Kurdistan jî roleke serekî û erênî di avakirina yekîtiya netewiyî de bibînin."…*ROJNEWS*



## Divê gelên Sûriyê destûra xwe amade bikin



Endamê Akademiya Aştiyê ya Cîhanî Lewend Mîrko diyar kir ku destûra ku di bin siya dagirkeriyê de, tê wateya serweriya dagirkeran li ser gelên Sûriyê. Divê gelên Sûriyê destûra xwe bi xwe deynin.

Girêdayî xebatên danîna destûreke nû ya Sûriyê endamê Akademiya Aştiyê ya Cîhanî helbestvan û rewşenbîr Lewend Mîrko destnîşan kir ku destûreke ku di vê demê de di bin siya dagirkeriyê de wê bibe serweriya dagirkeriyê.

Mîrko di berdewama axaftina xwe de wiha got: "Em behsa dagirkeriya dewleta tirk ya li Sûryê û binpêkirinên wê dikin. Dewleta Tirk dixwaze bi rêya nîqaşkirina destûra Sûriyê hebûna xwe ferz bike"

Mîrko wiha dewam kir: "Her destûrek bi rêya perlemana ku nûnertiya gelên herêmê dikin tê nîqaşkirin. Tevî vê jî divê hemû alî aloziya Sûriyê çareser bikin û destwerdanên derve di karûbarên Sûriyê de rawestînin û divê gelên Sûriyê destûra xwe bi xwe amade bikin."

Navenda Akademiya Aştiyê ya Cîhanê li Filistînê li bajarê El-Celîl e û di bin dûrûşma belavkirina aştiyê û bidawîkirina şer de li tevahiya cîhanê dixebite…*ANHA*



## Bi lihevhatina Deraa Astana têk diçe

Ezîz KOYLUOGLU

Ev demeke kes qala civînên Astana yan jî binavê xwe yê dawî Soçî nake. Neqalkirina dewletên Rûs, Tirk û Îran yên civîna Astana nîşan didin ku êdî pêwîstiya wan bi van civînan nemaye. Pêşketinên dawî li başûrê Sûriyê vê rewşê hinek din jî eşkere dike.

Bi serkêşiya Rûsan û bi beşdariya dewleta Tirk û Îranê, bi gote gotên wê qeyrana li Sûriyê çareser bikin, civînên Astanayê birêxistin kirin. Ev merhele du sale dewam dikir. Gelek kes lihevhatina dewleta Tirk û Rûsan wek lihevkirina perçekirina Sûriyê dinirxandin. Di encama vê lihevhatina her dû dewletan û kêmekî ji navbirina Îranê di nava van civînaên li ser Sûriyê de him liderdora Şamê him jî li gelek herêmên din yên Sûriyê grubên ji bo xwe digotin em opozisyonin li hêrêma Îdlib û bakûrê Helebê hatin komkirin. Ev siyaseta Rûsan hişt ku dewleta Tirk bajarê Efrînê yê rojavayê Kurdistanê dagir bike. Dagirkeriya dewleta Tirk bi alîkariya Rûsan, dîsa bicihkirina artêşa Tirk ya dagirker li herêma Idlibê di encama civînên Astana û Soçî de pêkhatin.

Lê hemû hêzên li Sûriyê siyasetê dikin, ne li ser planekî tevdigerin. Her hêz li gorî xwe bi planên cûda tevdigerin. Piştî du salan hemû planên hêzan li Sûriyê di nava guhertinê de ye. Him Rûs, him Îran him jî dewleta Tirk ya dagirker planên xwe yên li herêmê diguherînin. Di nivisa xwe yên hefteya berê de min dabû xuya kirin ku Rûsya, Emerîka, Îsraîl, Urdin, û Erebîstana Sûdî li ser jinavbirina Îranê li Sûriyê di nava ligerîna lihevkirinê de ne. Niha eşkere dibe ku di encama van hevdîtinên di navbera wan hêzên li ser herêma başûrê Sûriyê encam digrin. Ev lihevhatina Rûsan ya li başûrê Sûriyê ne wek li bakûrê rojavayê Sûriyê ye.

Neyê eşkere kirin jî di encama vê lihevhatina wan dewletan de gelek grubên opozîsyona Sûriyê ya Erebên Sûnî derbasî nava rejîma Sûriyê dibin. Dîsa rejîma Sûriyê wan herêma bi temamî dixe destê xwe. Lê di encama lihevhatina Rûsya û Tirkiyê li Idlib, Ezaz, Cerablus, Bab, herî dawî li Efrînê dewleta Tirk bi temamî dagirkere. Di vê lihevhatina Rûsya û dewleta Tirk ya dagirker de tu berjewendiyê rejîma Sûriyê û bi taybet ya Îranê tune ye. Berovajî vê, dewleta Tirk ya dagirker herêmek pirr fireh yê Sûriyê dagirker kiriye. Lê lihevhatina li başûrê Sûriyê bi temamî di berjewendiya rejîma Sûriyê de ye. Ev lihevhatina nû ya di navbera Rûsya, Emerîka, Îsraîl, Urdin û Erebîstana Sûdî li ser vê herêmê, dibe ku zemînek ji bo giştî li Sûriyê be. Di heman demê de ji bo hevdîtina Pûtîn û Trûmp di mijara Sûriyê de dibe wek gavekê jî.

Bi lihevhatina Emerîka û Rûsya li ser başûrê Sûriyê, di heman demê de îlan kirina jinavbirina Astanayê ye. Rûsya piştî bingehek lihevhatina bi Emerîka li ser Sûriyê peydekir, êdî civînên Astana û Soçî ji rojeva xwe derxist. Êdî dagirkeriya Tirkiyê wê zêdetir têkeve rojevê û wê Rûsya bixwaze xwe li herêmê zêdetir birêxistin bike. Lê ji ber lihevkirinên aborî yên Tirkiye û Rûsya wê nehêle ku Rûsya pirr aktif dijberiya Tirkiyê bike. Rejîma Sûriyê û hevkarên wê jî bi tena xwe nikarin li herêmên di bin dagirkeriya Tirkiyê de serwer bibin. Ev jî wê bingeha hevkariyekî nû li herêmê çê bike. Kurd û hevkarên wan dikarin baş ji vê rewşê sûd werbigrin.



# Ji bo tevlîbûna Festîvala Mazlûm Dogan bang

**KCDK-E ji bo 21. Festîvala Çand û Sporê ya Ciwanan a Mazlûm Dogan ku 14'ê Tîrmehê wê bê lidarxistin banga tevlîbûnê kir. KCDK-E' yê wiha got, "Wezîfeyeke me ya bingehîn e ku di vê pêvajoya dîrokî de beşdarî festîvalê bibin û têkoşîna hevpar xurt bikin."**

KCDK-E ji bo 21. Festîvala Çand û Sporê ya Ciwanan a Mazlûm Dogan ku 14'ê Tîrmehê wê bê lidarxistin banga tevlîbûnê kir.

Dîwana Hevserokatiyê ya KCDK-E daxuyanyeke nivîskî weşand û got, "Di vê demê de ku polîtîkaya bloka faşîst a AKP-MHP'ê ya li dijî demokrasiyê û Kurdan dijwartir bûye, Festîvala Mazlûm Dogan tê lidarxistin. Em di asteke bilind de tevlî festîvalê bibin, bi şiyara 'Serî hilde' berxwedanê geş bikin û bi vî rengî bersivê bidin."

Di daxuyaniyê de hate eragihandin ku Erdogan ê dîktator, polîtîkaya xwe ya şerê qirêj a li dijî Kurdan li Bakur, Rojava û Başûrê Kurdistanê girantir dike û hate gotin, "Tecrîda giran a li ser Rêber Apo jî bi rengê herî dijwar şidandiye û bi rebazên şerê qirêj êrîşê dibe ser hemû destketiyên gelê Kurdistanê. Dewleta Tirk a mêtinger ku li pêşberî têkoşîna azadiyê û gelê Kurdistanê tengav bûye, dixwaze bi konsepta şerê topyekûn bi ser bikeve.

Em bi berxwedana topyekûn pêşî li vê polîtîkaya kujer a dewletê bigirin. Di vê dema dîrokî de girîng e em ji her demê bêhtir yekîtî û rêxistiniya xwe xurt bikin û bi moral û motîvasyoneke bilind têkoşînê geş bikin.

Di demeke wiha de, Ciwanên Azad wê bi şiyara 'Li dijî faşîzmê serî hilde, Serokatî azad bike' roja 14'ê Tîrmehê 21. Festîvala Mazlûm Dogan li dar bixe. Wezîfeyeke me ya bingehîn e ku di vê pêvajoya dîrokî de beşdarî festîvalê bibin û têkoşîna hevpar xurt bikin. Çawa ku Mazlûm Dogan di nava tarîtiya faşîzma 12'ê Îlonê de bi berxwedana xwe ya destanî mêtingerî têk bir, divê em jî tevlî vê festîvalê bibin û têkoşîna hevpar geş bikin.

Bi navê KCDK-E em bang li hemû meclîs û xebatkarên xwe dikin ku ji bo 21. Festîvala Mazlûm Dogan a 14'ê Tîrmehê bixebitin, her kesî tevlî bikin û bi vê armancê seferber bibin. Em bang li gelê xwe û hemû hêzên şoreşger û demokrat jî dikin ku tevlî Festîvala Mazlûm Dogan bibin."

## Pirsgirêk bi diyalogê dikare bê çareserkirin




Berdevkê YNK'ê Sedî Ehmed Pîre li ser dagirkeriya Tirk a li ser xaka Başûrê Kurdistanê û daxuyaniyên Wezîrê Karên Derve yê Tirk Çavuşoglu, daxuyaniyeke çapemeniyê da û got, "Nêrîna me ya der barê pirsgirêkên li Tirkiyê de neguheriye û şer çareserî nîne. Divê pirsgirêk bi rêya guftugoyê were çareserkirin."


Berdevkê YNK'ê Sedî Ehmed Pîre li Hewlêrê derbarê dagirkeriya Tirk a li ser Başûrê Kurdistanê û daxuyaniyên Wezîrê Karên Derve yê Tirk Mewlûd Çavuşoglu de daxuyaniya çapemeniyê da. Pîre li ser axaftina Çavuşogulu ya , 'Hewlêr û Bexda piştgiriyê didin me ji bo em ser PKK'ê de biçin lê, YNK û Goran piştgiriya PKK'ê dikin û berdêla wê jî didin' de got, "Nêrîna me ya derbarê pirsgirêkên li Tirkiyê de neguheriye. Em weke YNK wisa bawer dikin ku pirsgirêk birêya aşitiyê dikare bê çareser kirin û şer çareserî nîne."

Pîre li ser pirsek ku gelo ewê navbeynkarî di navbera Tirkiye û PKK'ê de bikin jî wiha axivî, "Navbeynkarî kirina navbera Tirkiye û PKK'ê de ne karê me ye. Ji xwe di dema xwede Mam Celal navbeynkariyê kiriye."

Sedî Ehmed Pîre li ser axaftinên Çavuşoğlu ku YNK'ê hedef digire jî got, "Ev agahiyên dem û dezgehên îstîxbaratîne û hewldana xweşkirina têkiliyan bi aliyek re û dijberî kirina aliyekî din e."

Sedî Ehmed Pîre li ser cîrantiya Tirkiye û Herêma Kurdistanê jî îddîa kir ku coxrafya, li ser wan ferz dike ku bi Tirkiye re cîran bin û got, "Ya herî baş herdu alî li dewsa gef li hev bixwin, guftûgoyê bikin."…*ROJNEWS*

## Tevahiya Tirkiyê tê tecrîdkirin



Parlementerê HDP'ê yê Rihayê Omer Ocalan, diyar kir ku berpirsiyariya HDP'ê zêde bûye û got: "Hemû kesên ku dixwazin Tirkiye azad bibe, divê li dijî tecrîda li ser Ocalan tev bigerin."

Piştî merasîma sondxwarinê, Meclîsa Tirkiyê dest bi xebatên serdema 27'emîn kir. Di vê serdemê de tişta tê meraqkirin ew e ku wê di pergala Serokomariyê ya ji aliyê AKP-MHP'ê ve hat pêkanîn de bandora Meclîsê çi be.

Lê belê, partiyên muxalefetê jî hewl didin ku Meclîsê dîsa çalak bikin û ji bo vê bi motîvasyona zîndekirina pergala parlementeriyê tev digerin. Hem cudatiya profîla parlementerên HDP'ê hem jî fikra wê ya li ser "rêgezên demokratîk", HDP'ê bêtir derdixe pêş.

Parlementerê HDP'ê yê Rihayê Omer Ocalan, anî ziman ku HDP bêyî şik û guman wê barê bikeve ser milê wê bi cih bîne. Ocalan, anî ziman ku di rojeva wî de tecrîd, mafên gelên kurd û demokratîkbûyîna Tirkiyê heye. Ocalan bilêv kir ku tecrîda li ser Abdullah Ocalan tenê bi wî ne sînorkiriye û got: "A rastî îro civak hemû tê tecrîdkirin. Eger em doza azadî û demokratîkbûyîna vî welatî dikin, nexwe divê em li dijî tecrîdê derkevin. Ji roja ku tecrîd hatiye pêkanîn, li Tirkiyê maf û azadî lawaz bûne. Tirkiye ber bi karesatan ve diçe. Loma kesên ku li Tirkiyê difikirin divê hemû li dijî tecrîdê derkevin."

Ocalan, bang li gelê kurd kir ku xwedî li mafên xwe derkevin û got: "Êdî lukseke me ya ku sedsaleke din jî ji dest me biçe tune ye. Eger em îro li azadiya xwe xwedî dernekevin, dê hemû tiştên me bi dest xistine jî biçin." Ocalan, destnîşan kir ku tevî hemû êrîşan jî HDP bi awayekî hêzdar hebûna xwe ya li meclîsê didomîne û got: "Her ku êrîşî me dikin em zêdetir dibin û tên."

Ocalan bal kişand ser yekîtiya netewî ya kurd û got: "Bi awayekî şexsî ez ê herî zêde li ser yekîtiya netewî ya kurd hûr bibim. Civakeke ku yekîtiya xwe pêk neyîne, nikare di tu tiştî de jî bi ser bikeve."

## Miradê Nêçîrvan pêk tê, wê here cem dîktator

Nêçîrvan Barzanî ku gelek caran hêvî ji Tirkiyê kir hevdîtin li gel wan bikin, ji bo merasîma sondxwarinê ya serokkomarê Tirk Erdogan hate vexwandin. Li gorî nûçeyeke di ragihandinên ser bi PDK'ê de hatiye weşandin, Enqere bi awayeke fermî Serokwezîrê Hikûmeta başûrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî ji bo beşdarî merasîma sondxwarinê ya Serokkomarê Tirk Erdogan bibe, vexwendiye Tirkiyê.AKP û Erdogan ku di hilbijartinên 24'ê Hezîranê de bi hîle û sextekariyên mezin careke din hatin ser desthilatê, pîrozbahiya destpêkê ji Nêçîrvan Barzanî girtibû. Nêçîrvan Barzanî di nameya pîrozbahiyê de hêvî û daxwaz ji Erdogan kiribû ku wî vexwînin Tirkiyê ji bo peywendiyên xwe xweştir bikin. Di nûçeyê de têgotin ku Enqere bi awayekî fermî Barzanî vexwandiye ji bo merasîmê û behsa hevdîtinên ku Barzanî li Tirkiyê bi rayedarên Tirk re bike ne hate kirin.Wê sibe li koşka Serokkomariyê merasîma sondxwarinê ya Serokkomarê Tirk Erdogan pêk were.Tirkiye bi vê sîstema Serokatiyê derbasî rejîmeke nû ya bi navê serokatiyê bibe. Gelek şîrovekar vê sîstema nû weke sîstemeke nû ya Qraliyetê bi nav dikin û rejîmeke tekperest ya ji aliyê kesek tenê ve tê birêvebirin ji sibe şûn ve wê ji fiîliyatê derkeve bi awayeke fermî bikeve meriyetê.Serdana Nêçîrvan Barzanî jî di demek e ku artêşa Tirk li dîjî Başûrê Kurdistanê û Tevgera Azadîxwaz ya Gelê Kurd êrîşên berfireh yên dagirkeriyê daye destpêkirin de pêk tê. Gelê başûr jî li seranserê bajarên Başûrê Kurdistanê û li dijî dagirkeriya Tirk û Erdogan çalakiyan dikin û daxwaza derketina artêşa Tirk ji Başûr dikin.





## Gotinên çareserî û tunekirinê yên AKPyiyan

Burhan ERDEM

Piştî hilbijartina 24`Hezîranê êdî herkes li bendê ye ku AKPya pişta xwe daye MHP`ê bi hêzên herêmî û navneteweyî re bikeve nava hevkarî û têkiliyên qirêj û planên xwe yên tunekirinê bi hêzeke mezin bixe dewreyê. Di vê navberê de, tevî gotina `tunekirinê` wê gotina `çareseriyê` jî di devan de be. Bi taybetî di dema hilbijartinên herêmî de, wê ji Kurdan re propagandaya pêvajoyekje nû bikin.

Lê Hukumeta AKP`ê operasyonên xwe yên li dijî Kurdan di her platformê de dimeşîne. Ev yek ji herkesî re eşkere ye. Beyî ku navberê bide operasyonên xwe yên leşkerî û girtinên xwe yên di çarçoveya qirkirina siyasî de, siyaseta dij-kurd, weke pêvajoya çareseriyê, di her pêvajoyê de domandin. Di wan deman de ku Kurd û aştîxwaz, gotinên weke ``bêçalakîbûn, agirbest û çareserî`` bikardianîn jî, AKPyî bi tunekirina tevgera azadiya Kurd re radibû û rûdinişt.

Beriya AKPê jî heye ku dewletê polîtikayên bi heman rengî xistin dewreyê û xwest bi vê yekê desteka derdorên civakî yên berfireh bigire. Aliyê Kurd ev nêzîkatiya dewletê mîna `polîtikaya şerê taybet` qebûl kiribû. Wê rejîma şerê taybet jî, ji bo encamê bidest bixe ketibû nava hewldanên lihevkirinên neteweyî. Xeynî dijderketina çend derdorên aştîxwaz, dewletê wê tifaqa neteweyî bidest xistibû. Her dihate xwestin li gorî meyldariya neteweyî desteka pêwîst e bidest bixin. Li dijî têkoşîna Azadî û Demokrasiya Kurdistanê di salên 1990'î de, xwedêgiravî îslamhew wek alî derxistibûn pêş. Niha jî heman polîtika heye û tê xwestin li ser derdorên îslamî bi argumanên cuda ev siyaset were meşandin. Ev yek di pişt gotinên sexte yên reformîst de hatiye veşartin û wezîfeya pêkanînê dane AKP'ê.Me di pêvajoya hilbijartinê de jî dît ku mixabin kes û derdorên bi gotinên reformîst ên sexte ku di şexsê AKP'ê de tên îfadekirin hatine xapandin û ketine bin bandora wan hene. Weke di pêvajoya borî de jî hate dîtin, ji aliyê van derdoran ve wê dîsa rojane daxuyanî werin dayin û di organên weşan û çapemeniyê de cîh j iwan re were veqetandin. Di nivîsên wan de ji ber tunebûna çareseriyê, wê dîsa bi rengekî vekirî hêzên azadiya kurd sûcbar bikin.Gelekî muhtermel e ku gotinên ev derdoran, ango gotinên sexte yên AKP'ê û daxuyaniyên serfermandarê giştî û yên muxalefetê paralel bin. Tenê di nuansan de ferqa CHP`ê ji yên din hebe. Lê di cewher de tu cudabûna Serfermandariya Artêşa Tirk û hikûmeta AKP-MHPê û muxalefeta CHP`ê tu cudabûn tune ye. Di pirsgirêka kurd de di heman eniyê de cih digirin. Ji ber vê yekê jî tu polîtikaya van hêzan a çareserkirina pirsgirêka kurd nîne. Di vê mijarê de dest ji polîtikaya klasîk ya tunekirinê ne hatiye berdan. Dixwazin siyaseta tunekirin û înkarê bi gotinên cuda, bi rengekî xeternak bimeşînin. Kes û derdorên alîgirên aştî û çareseriya demokratîk a pirsgirêka kurd divê van rastiyan bibînin û li dijî polîtikayên nû yên şerê taybet bibin xwedî helwest. Ancax bi sekn û helwesteke pêwist a ji bo sazkirina aştiyeke mayinde û çareseriyeke demokratîk a pirsgirêka kurd van polîtikayên şerê taybet dikare pûç bibe.